

Parastina ji şewatê Daîre



Kalmar kommun
BRANDKÅREN

Parastina ji şewatê

Detektora şewatê



Eger agir bi mala te bikeve ji bo tu bigihî ji xênî derkevî detektora şewatê şansê te zêde dike. Divê detektora şewatê li ber deriyê odeya razanê bi tawanê ve were bi cih kirin. Eger tu li odeya razanê bateriya aletên xwe yê elektronîk dagirî, bo mînak telefonên destan, divê detektoreke şewatê li odeya razanê jî hebe. Divê li her çateke xênî herî kêm detektoreke şewatê hebe. Eger daîre ji 60 m² 'yî mezintir be divê hejmara detektorên şewatê ji yekî zêdetir be. Ji bo kontrolkirina bateriya detektorên şewatê berpirsiyarî li ser te ye, divê hemû baterî tim tije bin û detektor kar bikin. Eger detektora şewatê di mala te de nînbe ji bo yekî pê ve bike têkiliyê bi xwediyê xênî re deyne.



Tu detektora xwe ya şewatê wiha diceribînî

Pê li bişkoka li ser detektora xwe ya şewatê bike. Çend saniyeyan pêlêkirî bimîne. Eger li alarmê nede, bi bateriyên nû dîsa biceribîne. Detektorên xwe yê şewatê bi awayekî nîzamî biceribîne, bo mînak eger tu çûbî seferê dema tu hatî biceribîne û roja pêşî ya adventê biceribîne. Bila were bîra te û car caran detektorên xwe yê şewatê bi melkisê elektrîkê paqij bike.

Pêbîranîn ji bo ceribandina detektorên şewatê

Ji bo ku hejmara detektorên şewatê ku bi awayekî tekûz dişuxulin zêde bibe tora Aktiv mot brand bi awayekî nîzamî sms'ên pêbîranîna ceribandina detektorên şewatê dişîne. Tu dikarî bi awayekî hesan li ser malpera www.skyddadigmotbrand.se xwe qeyd bikî ka tu bi çi navberê dixwazî sms'ên pêbîranînê bistînî da ku tu detektora xwe ya şewatê biceribînî.



Vemirandoka şewatê ya destan

Tîma îtfaîyeyê tewsiye dike ku divê li mala herkesî herî kêm 6 kg pûdraya vemirandinê hebe û divê sinifa kalîteya wê jî herî kêm 43A 233 BC be. Havîngeh jî weke mal tê dîtin. Ji bo otomobîl, erebeyên bi vagon, gemî û hwd 2 kg pûdraya vemirandinê tê tewsiye kirin. Tu dikarî li cem şirketên ku aletên şewatê difiroşin û li marketên mezin an jî li marketên aletên avakirinê vemirandoka şewatê ya destan bikirî.



Betaniya vemirandina şewatê

Baş e ku betaniyeke vemirandina şewatê li malê hebe. Tu dikarî şewata cilan û şewatên biçûktir bi vê betaniyê vemirînî.



Timer û çavdêra tifikê (ocax)

L Gelek caran mirov xwe ji bîr dike tifik ango ocaxa xwe bigire û gelek caran agir ji vir dest pê dike. Tiştêkî li ser ocaxa xwe nehêle û ji xwe re bike edet û tim kontrol bike ka te ocax girtiye yan na. Timereke girtinê bi ocaxa xwe ve bike, wê demê ku tu ji bîr bikî ocaxê bigirî piştî demekê ew ji ber xwe ve tê girtin. Eger ocax gelekî germ bibe yan jî dû jê derkeve çavdêra ocaxê, ocaxê ji ber xwe ve digire. DÎQET! Divê xwediyê xênî çavdêra ocaxê pê ve bike.

Foto:
Johan Eklund

Tu wiha vemirandoka şewatê ya destan bi kar tînî

1. Emniyetê jê bişkîne.



2. Aletê nizm bike ser êgir.
Berê aletê bide ser êgir.



3. Bi destê xwe pê li destikê aletê bike.



Ewlehiya xwe û ya cîranê xwe zêde bike

Hersal di herêma îtfaîyeya Kalmarê de nêzîkî 32 şewat derdikevine holê. Ji bo ku tu ji aliyê şewatê ve ewlehiya mala xwe kontrol bikî vê lîsteya kontrolê bi cih bîne. Eger pirsên te li ser parastina ji şewatê hebin tu tim dikarî telefonî îtfaîyeyê bikî, 0480-45 75 10.

Ber li şewatê bigire

- Niftik û hesteyan (çeçmeq) ji zarokan dûr veşêrin.
- Eger tu ne li malê bî yan jî tu raziyayî bî qet makîneya cilan, ya firaqan û makîneyên din ên elektrîkê vekirî nehêle.
- Di temperatûra gelekî bilind de rûn û tewaş dikare bişewite. Dema tu tiştêkî biqelînê divê ji bo fetisandina agirekî muhtemel qapaxek nêzîkî te be. Ji bo vemirandina agirê ku bi rûn dikeve avê bi kar neyêne.
- Xwarina nîvşewitî û kelandina ziwa gelek caran sedemên şewatê ne. Fîltreya bakêşa ocaxa xwe bi awayekî nîzamî paqij bikin da ku rûn pê ve nemîne.
- Ti caran mûman bêyî nobedarî pêxistî nehêlin û ji bîr nekin wan bimirînin. Ti caran materyalê ku dikare bişewite ji bo xemilandina mûmdankan bi kar neyênin, bo mînak manşetên mûman ên ji qumaş, giyayê ziwa û tiştên wiha.
- Tiştên ku dikarin bişewitin li balkon û hewşa xwe nehêlin ji ber ku wê demê rîsk ji bo agirê pêxistî û agirê ji fişekên hewayî yê şaşhedfikirî heye.
- Aletên elektrîkê ên bi kabloyên qetiyayî û fişên xerabûyî bi kar neyênin.
- Fîşê baterîker, makîneya qehweyê, makîneya porziwakirinê û aletên wiha piştî bikaranînê jê derênin.
- Ti caran li ser nivînan an jî dereke din ku heye tu bi xew ve biçî cixareyê nekişîne.

Xelaskirina xwe plan bike

- Daîreyên dewletî şert dikin ku divê herî kêmtoreke şewatê li her qateke li mala te hebe. Bateriyên wan di wext de biguhere.
- Tê tewsiye kirin ku tu dikarî 6 kg pûdraya vemirandina êgir jî li malê hazir bikî.
- Tiştên xwe li ber derî, li korîdor û li ser pêpelokan nehêle. Divê haya te jê hebe ku eger tiştêk biqewime ev der rêya derketina acil e.

Eger agir dest pê bike... 

Eger agir dest pê bike...

XELAS



... li daîreya te:

Ji bo vemirandina êgir hewl bide. Eger tu nikaribî vemirînî deriyê odeya ku agir lê derketiye bigire û ji xênî derkeve. Eger ode tije dû bûbe – xwe di bin dû re bike, piraniya caran nêzîkî erdê hewa paqijtir e. Eger tu nikaribî xwe bigihînî deriyê derketinê, derkeve balkonê yan jî pencereyekê veke û bike hawar. Dema agir derketibe ti caran ji bo derketinê asansorê bi kar neyêne.

... li daîreya cîranan:

Eger li ser pêpelokan dû hebe – heta îtfaîye êgir vemirîne yan jî heta rewş baş bibe li malê bimîne. Deriyê ji derve yê ber bi pêpelokên apartmanê girtî bihêle. Daîre li hemberî şewatê dibe weke hucreyeke êgir, dikare ji 30 heta 60 deqîqeyî li hemberî êgir bisekine. Di vî wextî de îtfaîye digihe êgir vemirîne û te xelas bike.

ÎQAZ BIKE



Kesên din ên di dîareyê de îqaz bike da ku ew jî karibin xwe bigihînine ewlehiyê. Ji bo tevgereke sakîn hewl bide. Bila were bîra te ku heye zarok xwe di dolab û di bin textê razanê de veşêrin.

ALARMÊ BIDE



Dema ku te û malbata te we xwe gihande cihekî ewle telefonî hejmara alarmê 112 bike. Bi awayekî zû agahiyê bide ka çi qewimiye, tu ji kû dibakî û tu kî yî.

VE MIRÎNE



Pey vê re tu dikarî ji bo vemirandina êgir hewl bidî, lê xwe neke ti rîskên nehewce de! Avê bi pêtên êgir ve birijîne, ne bi pêlên êgir ve. Ti caran avê bi prîz û cihên elektrîkê ve neke. Eger agir di beroşê de be divê tu bi qapaxa beroşê êgir bifetisînî, qet avê pê de neke! Eger agir bi televîzyonê bikeve, fîş jê derêne û bi pûdraya vemirandinê yan jî avê êgir vemirîne.

Ev dosye ji aliyê Xizmeta xelaskirinê Storgöteborgê ve hatiye amade kirin û îtfaîyeya Kalmarê ev redakte kiriye.

Kalmar Brandkâr

Box 150, 391 21 Kalmar

Adresa serdanê Kaggensgatan 39
Telefon sentral 0480-45 75 10
Telefaks 0480-45 75 00
E-mail raddning@kalmar.se
Malper www.kalmar.se/brand

